

KADİM HİKMET

Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi



Kadim Hikmet, 13 (2025)
Sayfa: 58-72
Araştırma Makalesi / Research Article

Yayın Süreci:
Geliş / Recieved: 12.09.2025
Kabul / Accepted: 01.10.2025

NİRXANDİNEK Lİ SER TEKNİKA HELBESTA KURDÎ YA KLASİK

Dr. Öğr. Üyesi Muhammed Şerif Azarkan
Dicle Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi
Orcid ID: 0000-0002-6070-3432
serifazarkan0324@gmail.com

Kurte

Ev vekolîna me ya bi navê “Nirxandinek li ser Teknîka Helbesta Kurdî ya Klasîk” li ser lêkolînên kûr ên têkiliya zimanê erebî û helbesta kurdî ya klasîk e, bi balkişandina li ser wê yekê ku helbestvanên kurd çawa peyvên erebî bi şeweyên rewanbêjiyê di nav berhemên xwe yên helbestî de asîmîle kirine. Ev pêwendiya di navbera zimanê erebî û kurdî de ji sînorên metelokên zimanî yên sade derbas dibe da ku lihevhatineke kûr di pêkhatiya rewanbêji û hunerî de nîşan bide. Ev yek nîşana asteke bilind a şarezaiya zimanî di nav helbestvanên kurd ên klasîk de ye. Xebata me li ser du beşên sereke pêk tê. Di beşa yekem em li ser Teknîka helbestvanan kurd yên serdema klasîk ji aliyê asîmîlasyon ji peyvên erebî û rola dengdêrên kurdî di Asîmîlasyonê de û têkiliya zimanê kurdî û erebî. Di beşa duyem li ser cureyên teknîkê hûnerên kurdî û erebî, ji alîyan aheng, îqtîbas, kînaye, teşbih, tenasûb ve. Di encamê da jî xalên sereke ên vekolînê hatin tesbîtkirin û li ser wan analîzeke giştî hat kirin.

Peyvên sereke: Helbesta Klasîk, Teknîk, Kurdî, Erebi.

Öz

Bu araştırma, "Klasik Kürt Şiir Tekniğinin Değerlendirilmesi" Arapça dili ve klasik Kürt şiiri arasındaki ilişkiye odaklanan bir incelemedir. Kürt şairlerinin Arapça kelimeleri şiirlerinde nasıl edebi tarzlarla özümseyip kullandıklarına dair önemli bir bakış sunmaktadır. Arapça ve Kürtçe arasındaki bu ilişki, sade dilsel kuralların ötesine geçmektedir. Edebi ve sanatsal anlamda derin bir etkileşim göstermektedir. Bu etkileşim, klasik Kürt şairlerinin dil bilincinin yüksek bir seviyede olduğuna işaret eder. Çalışmamız iki ana bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde, klasik dönemdeki Kürt şairlerinin Arapça kelimeleri asimile etme teknikleri ve bu süreçte kısa ünlülerin rolü ile Kürtçe ve Arapça arasındaki dilsel ilişki ele alınacaktır. İkinci bölümde ise Kürt ve Arap sanatındaki teknikler, ahenk, alıntı, kinaye, teşbih ve tenasüp açısından incelenecektir. Sonuç bölümünde de araştırmanın ana bulguları tespit edilip bu bulgular üzerine genel bir analiz yapılacaktır.

Anahtar Kelimeler: Klasik Şiirler, Teknik, Kürtçe, Arapça.

Abstract

This study, titled "A Critical Evaluation of Poetic Techniques in Classical Kurdish Poetry," focuses on the relationship between the Arabic language and classical Kurdish poetry, examining how Kurdish poets have assimilated Arabic words into their poetic works using stylistic methods. This connection between Arabic and Kurdish transcends the simple linguistic boundaries, highlighting a deeper fusion in the realms of literary and artistic expression. It demonstrates a high level of linguistic sophistication in the classical Kurdish poets, reflecting a significant cultural and intellectual impact of the Arabic language on their works. Our study consists of two main sections. The first section will address the techniques used by classical Kurdish poets to assimilate Arabic words, examining the role of short vowels in this process and the linguistic relationship between Kurdish and Arabic. The second section will analyze the techniques in Kurdish and Arabic arts in terms of rhythm, quotation, metaphor, simile, and correspondence. The primary research findings will be listed in the conclusion, and then these findings will be broadly analyzed.

Keywords: Classical Poetry, Technique, Kurdish, Arabic.

Destpêk

Helbest cureyeke edebiyata Kurdî ya Klasîk e ku di sedsalên navîn de pêşketiye û heya serdema nû jî berdewam dike, li ser bingeha kevneşopiya helbestvanên Kurd. Ev helbest beşeke girîng a mîrata edebiyata Kurdî tê dîtin û nîrxên çandî, olî û felsefî yên civaka Kurdî di hemû serdeman de nîşan dide.

Helbesta Kurdî ya Klasîk di nav edebiyata Kurdî de yek ji pîvanên sereke yê ku pêşkeftina zimanî, çandî û hunerî di serdema xwe de tê dîtin. Di heman demê de, helbesta Kurdî di çarçoveya kevneşopiya zimanê Kurdî û têkiliya wê bi zimanên din, bi taybetî zimanê erebî, pêşketinê girîng

ên hunerî û edebî pêşkêş dike. Ev têkiliyê bi taybetî di helbestên ku peyvên erebî tê de bikar anîn e, her weha di pêkhateya rewanbêji û hunerî de, rolê mezin heye.

Ziman û edebiyata Erebi jî çavkaniyeke edebiyata Kurdî ya klasîk e. Hem peyv û îfadeyên Erebi hem têgehên edebî hem teşeyên nezmê yên ku Ereban afirandibûn, hem jî wezna 'erûzê ya ku di van helbestan de bikaranîbûn ji edebiyata Erebi derbasî edebiyata Kurdî bûn (Adak, 2015, r. 41).

Teknîk di nav berhemên kurdî ên klasîk de cihê xwe digrê, Edebiyata klasîk ne tenê xezîneyek rûhanî û mijarî ye, lê her weha qada pêşkeftina teknîk û hunerî ya helbestê ye. Di van berhemên klasîk de wek teknîkên Aheng, Îqtîbas, Kînaye, Teşbih, Tenasub, hemû dikevin di nav bingeheên estetîk û zanistê edebiyatê de.

Armanca lêkolînê ew e ku aliyên teknîkî di nav helbesta Kurdî ya klasîk de ji aliyê Aheng, Îqtîbas, Kînaye, Teşbih û Tenasub û wateyan ve analîz bike, bi taybetî li ser girîngiya zimanê Erebi wek zimanê Qur'ana pîroz nîşan dide. Ji ber ku Qur'ana pîroz ne tenê çavkaniyek olî ye, lê bi awaye referansek zimanî û rewanbêji girîng e, ku helbestvanên Kurd di avakirina helbestên xwe de bandor li wan kirine. Îqtîbasa wêjeyî ya peyvên Qur'anê û pêkhateyên rewanbêja Erebi di nav helbestên Kurdî yên klasîk de, nîşan dide ku çiqas zimanê Erebi pir bi qîmet e, di nav helbestvanên Kurd de, ziman di heman demê de semboleke rewanbêji û olî ye jî.

Ji bo encama lêkolînê me berhemên hin şa'iran yên serdema klasîk û hin helbestvanan kurd yên serdema klasîk ji aliyê asîmîlasyon ji peyvên erebî û têkiliya zimanê kurdî û erebî û cureyên teknîkê hûnerên kurdî û erebî, ji alîyan aheng, îqtîbas, kînaye, teşbih, tenasub ve. Di encamê da jî xalên sereke ên vekolînê hatin tesbîtkirin û li ser wan analîzekî werê kirin

1. Têgeha Teknîkê

Di helbesta klasîk de bikaranîna teknîka hunerên edebî taybetiyeke jêner e ku bêyî wan nezm wek helbesteke baş nayê dîtin. Bi bikaranîna teknîka hunerên edebî maneya helbestê kûrtir dibe û tevî wê hevok kurtir dibe (Demir, 2019, r.57).

Teknîk komek e ji amûrên ku di nivîsandina helbestê an jî berhemeke edebî de têne bikar.

1.1. Teknîka Di Nav Helbestên Kurdî De

Ziman û edebiyata Erebi jî çavkaniyeke edebiyata Kurdî ya klasîk e. Hem peyv û îfadeyên Erebi hem têgehên edebî hem teşeyên nezmê yên ku Ereban afirandibûn hem jî wezna 'erûzê ya ku di van helbestan de bikaranîbûn ji edebiyata Erebi derbasî edebiyata Kurdî bûn. Gelek helbestvanên Kurdan hinek helbestên xwe bi tevahî bi Erebi nivîsîne. Hinek helbestvanan jî di nav helbestên xwe yên Kurdî de cih dane hinek rêzên/misrayên Erebi ku ji

Van cure helbestan re mulemma tê gotin. Bo nimûne Melayê Cizîrî di vê beyta jêrîn de rêza/misraya duyem bi tevahî bi zimanê Erebi nivîsiye (Adak, 2019, r. 94).

Mela her wî bibîn her wî eger her wî dinasî tu

Huwe'l-me'bûd huwe'l-meşhûdu bel la xeyre fi'd-dareyn (Cizîrî, 2012, r.484).

1.2. Asîmîlasyon Ji Peyvên Erebi

Di axiftina xwezayê de hertim zehmet e ku dengê du caran li pey hev derbikeve, wekî di عَلَّم ('Ellem) de ku dibe عَلَم ('El'em). Di heman demê de li pey hev derxistina du dengên ji heman qada vegotinê jî pir dijwar e, wekî di مِنْ رَأْسِكَ (Min Re'sike) de ku wekî مِرْأَسِكَ (Mir'asike) tê bilêvkirin. Lewma em serî li asîmîlasyonê didin. Di erebî de asîmîlasyon الإِدْغَام dema ku du herfên wek hev (an jî dengên wek hev) an jî dengên berawirdî yên mîna hev dibin yek dengê jêv (ducarî) / herfa حَرْف مُشَدَّد. Ev nivîs bi erebî asîmîlasyoneke pir berfireh dide (Misirî, 2004, r.59).

1.2.1. Rola Dengdêrên Kurt Di Asîmîlasyonê De

Di Erebi de ji dengdêrên kurt re "hereke" tê gotin. Sê hereke, wate sê dengdêrên kurt hene. Ev hereke wekî sembol li jêrê yan li jorê herfên bêdeng tên danîn û her semboleke dengêkî kurt dide herfa xwe ya bêdeng. (Adak, 2015, r. 377-378).

Dengdêrên Kurt (Hereke) angî الفَتْحَة (Fethe), الضَّمَّة (Demme), الكَسْرَة (Kesre), û السُّكُون (Sukuun), di rûdana asimilasyonê de roleke giring dileyzin. Asimilasyon pêk tê di navbera du tîpan an jî dengên de.

Ev hereke û dengên ku didin ev in:

1. Ser/Zeber (Fethe/Nesb)

Ser, dengê "e" yê dide nîşandan. Sembola wê (') e. Ev sembol li ser herfa bêdeng tê danîn. Wekî; fe: فَتْح, te: تَتْ, he: حَتْ, fetehe: فَتَحْ

2. Ber/Pêş (Demme/Ref')

Ber, dengê "u" yê dide nîşandan. Sembola wê (ُ) e. Ev sembol li ser herfa bêdeng tê danîn. Wekî; ku: كُ, ti: تِ, be: بِ kutibe: كُتِبَ

3. Cir/Zêr (Kesre/Cer)

Cir, dengê "i" yê dide nîşandan. Sembola wê (.) e. Ev sembol li bin herfa bêdeng tê danîn.

He: حِ, si: سِ, be: بِ hesibe: حَسِبَ

2. Têkiliya Zimanî

Tesîra erebî li ser zimanên din, bi taybetî zimanên misilmanan, bi berhefirehî tê zanîn û gelek tê behskirin jî. Lê pir kêmtir behsa tesîra zimanên din li ser erebî tê kirin.

Lê çawa ku erebî tesîr li gelek zimanên din kiriye, wisa gelek zimanan jî bandoreke mezin li ser erebî kiriye. Zimanên îranî yên wek farisî, kurdî, pehlewî û avestayî jî yek ji wan binemalên zimanan e ku herî zêdetir tesîr li erebî kiriye, bi taybetî bi wê yekê ku erebî gelek peyv ji zimanên îranî wergirtine.

Wek zimanên din jî, erebî gava ku peyvên biyanî wergirtine, ew kêmkirî li gor şert û mercên xwe yên dengnasî guherandine.

2.1. Teknîka Zimanên Kurdî û Erebi

Di vê beşê de em dikarin têgihiştina çanda herdu ziman di navbera edebiyatên kurdî û erebî de nîşan bidin. Peyvên erebî ne tenê di helbesta kurdî de dîtin, lê her weha di çand û çarçoveya rewanbêjî de jî heye.

Dema berhemên pêşî yên edebiyata Kurdî ya klasîk dihatin dayîn, civaka Kurdan bûbû civakeke Îslamî û şaristaniya Îslamî bandor li wê civakê kiribû. Edebiyata Kurdî di bin bandora wê şaristaniyê de pêşve çû û kemilî. Sistema Îslamiyetê di destpêkê de li ser esasên kitêba pîroz Qur'an û hedîsên Cenabê Pêxember ava bû (Adak, 2019, r. 45).

3. Cureyên Teknîkê Hûnerê

Hunera edebî yên di helbesta klasîk de rûleke girîng û bandorek heye ku gotina helbestvan xurt dikin û pergala diyarên wate, mecaz û teşbîhê dewlemend dikin. Ew huner bi taybetî li ser xweşikirin, xemilandin û ronîkirina peyv û wateya gotinê pêk tên. Di edebiyata klasîk de, ew bi sê beşên sereke ve sernavkirin: me'anî, beyan û bedî', her yekê bi rewşên taybetî peyv û wateya gotinê radikeve. Me'anî peyvên rastîn vedikire, beyan têkilîya navbera lefz û maneyê derdixe, û bedî' bi ciwankirina deng, peyv û ahengê vegotina helbestê tê bikaranîn.

3.1. Aheng

Aheng (di Îngilîzî de “harmonî”, di Erebî de “îqa”), taybetiyeke jêneger a hemû hunerên bedew e. Aheng, di edebiyatê de hêmaneke bingehîn a şêwaz û estetîka edebî ye û bi kurtî wek “rêxistin û yeksaniya di nezm û pexşanê de ye ku bi bihîstina wê ruhê mirov hestiyar dibe” dikare bê pênasekirin (Adak, 2017, Mukaddime, 8 (Özel Sayı 1).

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘înayet
Qismet me xemr û cam e di deftera hîdayet

Husn û cemalê canan nadêritin tu payan
Herçi nebit bîdayet esla nehin nihayet (Cizîrî, 2012, r.196)

Feyda ‘ulûmê hikmet cama sedef ku gêra
Me j’destê muxbeçan dît bi Mishef û bi ayet

‘Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wîlayet (Cizîrî, 2012, r.197)

Gunah û zuhd û tamat hilnagîrit xerabat
Kesê bi vî derî ret divê bikit rî’ayet

‘Îşqê ji herdu çeşman ewwel di dil eser kir
Lê zerre zerre axir sotin kir û sirayet (Cizîrî, 2012, r.198)

Şakissilahi her dem bi kuştina Melê bit
Gazindeyan ji kê kim ji kê bikim şîkayet

Cama di destê şahid jengê ji dil dişotin
Pîrê muxan ji rendan weh weh dikir rîwayet (Cizîrî, 2012, r.199)

Etwarê ‘îşq û mestî esrarê butperestî
Teqrîrê sed rîwayet nakit li bo kîfayet

Li yetmeinne qelbî ‘eynulyeqîn dibexşet
‘Eynul’eyan divêtin kafî nehin dîrayet (Cizîrî, 2012, r.200)

3.2.Îqtîbas

Îqtîbas yek ji şêweyên rewanbêj û hunera edebiyata Erebi ye, Mebesta wê ew e ku metnên ji Qur'ana pîroz an jî Hedîsên şerîf di metnên wêjeyî û zanistî de bi cih bikin, bi armanca xurtkirina wateyê û xweşîkbûnê an jî piştrastkirina peyama ku helbestvan dixwaze bi şîkê rewanbêjê wê bikaribîne.

Di ilmê rewanbêjê de îqtîbas teknîkeke edebî ye ku helbestvan an jî pexşandêr beşek ji Qur'ana Pîroz an jî Hedîsên şerîf di metnên xwe de cih digire. Çi di helbestê de û çi jî di pexşanê de, ku ev beş bi eşkereyî bi Xweda Te'ala an jî Resûlê Xwedê lê be. Îqtîbas wekî amûra rewanbêjê tê bikar anîn ji bo wateyê xurt dike û têgihîştina axaftinê zêde dike (Teftezanî, 1411 h, r. 307).

Îqtîbas bêjeyeke e'rebîye û ji koka lêkera يَفِيءُ hatîye dariştin. Di wateya xwe ya ferhengî da bi wateya pêta agir, girtina pizotek agir û di sûd girtina ilmê da hatîye bikar anîn (Înci, 2020, r.4)

Îqtîbas li ser çend cureyan tê belavkirin, têgihîştin- peyman- çareserî – nişandan.

Îqtîbas: ku axêver di nav gotinên xwe de çi helbest û çi jî pexşan bê ku peyvên kesên din bi gotin û wateya xwe ve bihewîne. Ev gotin dikare ji Qur'ana pîroz, an ji gotinên Pêxember, an ji gotinên pêşîyan, an ji hîkmetên navdar, an ji gotinên rewanbêjên mezin ên ku pir belav bûne, were wergirtin". (Demaşqi, 1996, r. 136).

Îqtîbasên jê Qur'ana Pîroz

Mushefa husn û cemalet sûreta xal û xetan

Ma telewna xeyre herfin la wel-Qur'anin mecîd (Cizîrî, 2012, r.295)

﴿قُلْ وَالْقُرْآنِ الْمَجِيدِ﴾

(Sûreyê Qaf, 50/1)

Li vir, îqtîbasa "**Qur'anin mecîd**" ev rûdêmê sûreyê bi awayekî rastarast ji Qur'ana pîroz tê, û xeyr ji bilî herfa "na" pê ve nexwendîye. Buye yek ji miftiyên dinî ya helbestê de.

Lew bum herif lew bûm nedîm

Min 'îşqeka dijwar heye

Kovî kirim serfa ezîm

Min hêj meya pêrar heye

Minnet ji Rahman ê Rehîm

Min mîrekî settar heye

(Teyran, 2014, r.104)

﴿الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ﴾

(Sûreyê Fatîhe, 1/3)

Li vir, îqtîbasa "**Rahman ê Rehîm**" ji sûrya Fatîha bi awayekî rastarast di nav Qur'ana pîroz tê.

Avek mehînim kemter im

Min cerg û dil bûne birin

Sewda û dîn û epterim

Pabendê wê nefsa le'în

Muksîyê jar û bedtir îm

(Teyran, 2014, r.110)

Ferhemnî xeyre rahimîn

(Sûreyê Murselat, 77/20)

﴿أَلَمْ نَخْلُقْكُمْ مِنْ مَّاءٍ مَّهِينٍ﴾

Li vir, îqtîbasa "**mehîn**" ji sûrya Murselat ku nîşan dide "**Ma me ji aveke nehêja hûn nexuliqandin.**"

(Sûreyê Mûmînûn)

﴿وَقُلْ رَبِّ اغْفِرْ وَارْحَمْ وَأَنْتَ خَيْرُ الرَّاحِمِينَ﴾

Li vir, îqtîbasa "**Ferhemnî xeyre rahimîn**" ji sûrya Mûmînûn ku nîşan dide "Tu jî bi bej "

Perwerdekarê min, tu min bibexşînî, rehmê li min bikî: ji xwe rehmê dîkin tu yî "

Bi husna **ehseni t-teqwîm** û zahir soretê zat î

(Cizîrî, 2012, r.635)

Nezer dî **elleme l-esma** we batin 'eyn î mir'atî

(Sûreyê Tîn, 95/4)

﴿لَقَدْ خَلَقْنَا الْإِنْسَانَ فِي أَحْسَنِ تَقْوِيمٍ﴾

Ev misra ji ayetê "ahseni teqwîm" (yaratinek bi şan û şeref) tê îqtîbas kirin, ku ji sursureya Qur'ana
oz tê. Ev îqtîbas tê bikaranîn da ku xweyî bêtir armanca estetîk û qediyên edebiyî bibin, bi
:girî ya dinî.

Dil Dil ji ber **narê mecazî**, bil-heqîqet, bû pereng

(Cizîrî, 2012, r.294)

Narû qelbî fî hewaha misle narin fil-hedîd

Di nav vê misraye de îqtîbas "**narê mecazî**" agirên mecazî yên evîn û şewqê, çiku ew jî dilan
dişewitîne.

"**Narû qelbî fî hewaha misle narin fil-hedîd**" jî xurtkirina agirê evîna dilê wê wek agirên ku li nav
dîd (hesin) de tene çêkirin.

Rebb xetê reyhanî ye ser **sûretê Qur'an'î** ye?

Y Yan xatema sultanî ye, mir'at e, yane menzer e

(Xanî,

- Di vê misrada, îqtîbasa "ser sûretê Qur'an'î" tê bikaranîn ku diyar dike helbestvan ji Qur'ana
Pîroz rêzeke hunerî wergirtibe. Lê hîn jî helbestvan li benda geşandina wateyên hunerî ye.
tekelluf duxwerim sondê bi **Qur'an a şerîf!**

(Xanî,

"Xanî"asûretê canane bi min **sûretê Nûr**

- Ev misra ji bi rûmeta Qur'ana şerîf tê bikaranîn. Îqtîbasa "Qur'an a şerîf" ji bo piştrastkirina. Peyva "sûretê Nûr" ku sûret û dêmên Mehbûban wekî sûretê nûrin, çawan ku di sûretê nûr da behs û teswîra navê Xweda yê.

3.3. Kînaye

Kînaye şêwazek hunerî ye ku ji bo îfadekirina wateyê bi awayekî nerasterast tê bikaranîn, ku du wateyan hildigirin: wateyek nêzîk, xuya û wateyek dûr ku ji çarçoweyê tê fam kirin. Kînaye nîşan dike li ser wataye ew diyar dike bê ku eşkere bike, herwiha ji bo armancên edebî wekî xemilandin anku destnîşankirinê hunerî, civakî û çandî (Teftezanî, 1411 h, r. 257).

Kînaye, çi nivîskî û çi ji devkî be, di gotinekê de du wateyan di nav xwe diheve. Anku ji hunera kînayeyê du wate derdikevin û ya ku tê qestkirin wateya mecazî ye. Nivîskar an ji helbestvan, tiştê ku nexwaze rasterast bêje bi vê hunera edebî gotina xwe bi awayekê mecazî tîne ziman. Gelek caran di hunera kînayeyê de gotinên pêşîyan û biwêj tîne bikaranîn. Di helbestên Gulordî de ji hunera kînayeyê tê dîtin. Bo nimûne (Yılmaz, 2023, r.76).

‘Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz

Dê li nik sahibdilan hetta ebed bit serferaz (Cizîrî, 2012,

"Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz" Di vê rêzêda, peyvên "aşiq" (evînkar) û "berqa mecaz" wekî kînaye tîne bikaranîn. Ev kînaye hunerê ji bo nîşandanê tiştê dirêj tê xebitandin.

Keşfa esrarê şifatan bêmehebbet nabitin

Sûretê esma divêtin da bikîn jê fehim raz (Cizîrî, 2012,

"Keşfa esrarê şifatan bêmehebbet nabitin": Peyvên "keşfa esrarê" wekî kînaye di nav peyvên edebî de tîne xebitandin. Ew sirr û wate, di navbera mecaz û rastî de tê dayîn.

Lami`a husn û cemalê dê ji `ilmî bête `eyn

‘Işq-i da jê hilbitin kê dî heqîqet bêmecaz (Cizîrî, 2012, r.333)

"Lamia husn û cemalê dê ji ilmî bête eyn" Yan birûsk e, yan ji her tiştê ku dibiriqîne. Lamia husn û cemal kînaye dike Husn û cemal e. Her du ji yanî xweşik lî mebest ji xweşikiya ezelî, ciwaniya.

3.4. Teşbîh

Di hunera teşbîhê de, gelek pênaseyên taybetî hene. Teşbîh têgihiştina wateya şibandinê ye, ku ji du tiştên ku di navbera wan de têkilî hebe tîne dayîn. Mebest ji vê şibandinê xurtkirina wateya aliyê lawaz e.

Ev wateya ku ku pêşîya wan di nava wateyan de hevrastin dike, bi awayekî taybetî ji bo armancên taybet. Li vir, encama pêşîyê ji çend tiştêkên cuda nayê xistin.

Ew nîşana tişte di tişte din de parve dike bi awayekî diyar tê nîşandan. An jî nêzîkbûna armançê û wekhevî ji gelek çavkaniyan nayê derxistin (Demaşqi, 1996, r. 162).

3.4.1. Cureyên Teşbîhê

3.4.1.1. Teşbîha Mursal

Teşbîhek e ku li nav de amûrê teşbîhê tê gotin. Ku têkiliya di navbera tiştên ku tê de hatine bikaranîn û yên ku jê re hatine dayîn (Al-Şa'îdî, 2005, r. 462).

Fil cumle: çi ewwel û çi axir

Elqisse: çi mu'min û çi kafir

(Xanî,

Teşbîh: Ev beyt pêşniyar dike ku xwedê her tiştî di destpêkê û dawiya xwe de ne, herdu tîpê (ewwel û axir) di heman tişt de ne.

"Elqisse: çi mu'min û çi kafir"

Teşbîh: Di vê beytekê de, nîşan dide ku xwedê ye ku mu'min û kafir afrandine, li gorî her tişt ji aliye xwedê ve hatine çêkirin. Ev beyt, pêşniyara xwedê ya ku hemû kesan tene nîşandan.

3.4.1.2. Teşbîha Mu'ekked

Teşbîha mu'ekked ji Teşbîha mursal bihêztir û hêsantir e, ji ber ku teşbîh û mûşebbeh bi hev re girêdayine, mebesta jê bê ku amûrek teşbîhê bikar bîne bi hev ve giredide, ku ew wekî yek tişt xuya dikin (Atîq, 1982, r. 81).

Teşbîha ku tenê edat-î teşbîhê tê de tune be, ew dibe teşbîh-î muekked. Di vê teşbîhê de her sê hemanên teşbîhê hene lê edat-î teşbîhê hatiye hezifkirin. Di vê teşbîhê de daçekên weke wek, weke, mîna, nota, fena û hwd.

Ey wahidê pînhan ku ji zatê Te ne peyda,

Ev kewn û mekân, erd û sema kûnbedê xedra

(Xanî, r.111)

"Ev kewn û mekân, erd û sema kûnbedê xedra"

Teşbîh li ser kewn û mekânê tê serwerdan, lê bi awayekî mu'ekked. Ev nîşanên wêjeya sufî û felsefî di helbestên dinî ya klassîk de wê cihê girîng bi teşbîha mu'ekked dide.

3.4.1.3. Teşbîha Mufassil

Cureyek şibandinê ye ku tê de behsa çar hêmanan tê kirin: şikil, tişt, ku jê tê şibandin, rûyê şibandinê û amûrê şibandinê. Ev teşbîh rasterast pêwendiya di navbera teşbîh û mûşebbeh de ku amûra şibandinê bikar tîne (Demaşqi, 1996, r. 163).

Teşbîha ku her çar erkanê teşbîhê jî tê de be ew dibe teşbîha mufessel. Ji vê teşbîhê re "teşbîha hurgilî" jî tê gotin (Deniz, 2017, r.51)

Rojê îdê, tarî ye; wek leylê bêşem û çira

Ser xerîb û bêkesê dûr bit ji yar û hogira

Ġadîya îdê limin huzn e, gelî yar û bira!

Dil keîb im, dil keîb im, dil keîb im, dil keîb!

(Aqtepî, 2019, r.42)

- Muşebbeh: "Roja îdê" (rojê îdê, hebûnê dema taybetê ya baş û şadîyê).
- Muşebbehun bîh: "leyl" (şev, ya ku bi tarî û bêronahiyê ve dîtin dibe).
- Wecha şebah: Aliya hevpariya şibandinê di navbera "rojê îdê" û "leylê bêşem" de tarîbûn û bêşevahiyê ye.

Dilber şikîna şekkerek, fe qultû ya rûhî meta?

Go min heta xatir hebit, min go çikim ez pa "heta"

(Cizîrî, 2012, r.79)

1. Beş (Bent 1):

- Muşebbeh: "Dilber" (hevalok, jîna herî dilşewatker).
- Muşebbehun bih: "şeker" (şîrîn û beya xweşik e).
- Wecha şebah: Şîrînî û xweşiyekirinê (tarîfek li dilbera xweşik).
- Wecha şebah: "wek" anîn.

2. Beş (Bent 2):

- Muşebbeh: "Zulfan" (Yeka wê zulf e: Peyveke hevpar e, yanî: Pêşenîk, porê pêşiya serî yê ku bi ser enî û cênîkan de tê berdan. Ji adetân jinan e ku wan zulfan mîna nîvxelekan difitilînin û mîna herfên dal û lam û cîman xuya dibin.).
- Muşebbehun bih: "çîn çîn" (Parçe û kûlek yan dar hewşek, Sifetê zulfan e, yanîyên belawela).
- Wecha şebah: Girtina zulfên li hev (bi awayekî tarî û bikev bikaranîn).
- Wecha şebah: "Tu bes çîn çîn bike."

3.4.1.4. Teşbîha Mucmel

Teşbîhek e ku li nav de wekhevê teşbîhê nehatiye kirin (Demaşqi, 1996, r. 173).

Ew teşbîha ku ji xeynî unsura “rûyê lêkçûnê (wechû Çibih)” her sê unsurên din hene, jê re “Teşbîha Mucmel” tê gotin (Yılmaz, 2023, r.30)

Mulk û Melek û felek bi carek

bil cumle Te çêkirin, tebarek! (Xanî, r.57)

"Mulk û Melek û felek bi carek"

Teşbîh: Ev beyt nîşan dide ku Mulk û Melek: Alema berçavî û, neberçavî (alema şehadet û xeybê).

"bil cumle Te çêkirin, tebarek!"

- **Teşbîh:** Di vê beytê de, nîşan dide ku xwedê her tiştî bi hikmeta xwe çêkiriye, di nav hemî tiştên xwe de. "Tebarek" nîşana xweşbûna xwedê ye, ku her tiştî ji ber wê çêbûyî ye.

3.4.1.5. Teşbîha Belîğ (Belîx)

Teşbîhek e ku ne amûrê teşbîhê ne wekhevê teşbîhê tê gotin (Demaşqi, 1996, r. 173).

Di vê teşbîhê de, her du unsurên alîkar ên teşbîhê (amraz û rûyê lêkçûn) nînin. Tenê her du unsurên girîng (leçû û lewçû) hene. Ev cure ji cureyên din xurttir e. Lewra çiqas unsur ji teşbîhê kêmtir be ewqas bihêztir e. Bikaranîna vê cureyê ne karekî hêsan e û herkes nikare, vê cureya teşbîhê bikarbîne (Yılmaz, 2023, r.30).

Dilberê îro seher avâte cergâ min du dox

Yek li sîne yek li dil da lew ji min tân ax û ox

Ah û oxân min ji dil tân, lâ ji ber tîra qizil tân

Yan ji kovanên di kul tân, jê dizât her xûn û zox

(Cizîrî, 2012,

1. Beş (Bent 1):

Teşbîha belîğ: "Dilberê îro seher" (îro yarê danê berbangê du gürz avâtin kezebê, yek li sîng yê din li dil da.

2. Beş (Bent 2):

Teşbîha belîğ: "Ax û nalîn ji dile tê, yan jî ew ji ber hesret û kovanê birînê tê yan: ji ber germiya tayê ku hatiye tê, û ji wê birînê xwîn û kâm diherike.

Paşî lêvên wê venaxum mutleq ava Kewserê

Min nevê dunya bi carek, piştî wê sîmîn berê

(Xanî, r.306)

"Paşî lêvên wê venaxum mutleq ava Kewserê"- Lêvên dîlber wek ava Kewser (avê bi serekî di Cenneta Musliman de) têne teşbîh kirin.

Ey ayîne ê dil bi Cemala Te mûcella

Sed sefhe bi yek zerre ji nûra Te mûtella

Însan, Te ji bo alemê Kubra kire nusxe

Lew mûdxeyekî jê Tu dikî 'Erşê mûella

(Xanî, r.112)

1. "Ey ayîne ê dil bi Cemala Te mucella"

Ev teşbîh cemala pirzîya Xweda wekî ayînê ya dilî jîr tê dibîne. Teşbîhî di nav edebiyata klasîk de evîna derûnî ya dilê bi rengên zîndî û hêjayî wêjeperestî dibînin.

2. "Lew mudxeyekî jê Tu dikî Erşê muella"

Erşek muella (Textê bilind) tê teşbîh kirin wekî cemala pîroz a dînî. Ew teşbîh, bîrên teolojîk yên girîng dîyar dike ku cemala Xweda bi rewbendek derûnî tê nîşan bide.

3.6. Cînas

Di Kurdî de ji vê ciwankariyê re wisa jî tê gotin "hevtîpî/hevdengî". Ji bêjeyên ku nivîsîna wan û bilêvkirina wan wekhev be, lê wateya wan jî hev cude bin ji wan re cînas (hevtîpî) tê gotin. Eger helbest bi tîpên Erebi hatibe nivîsîn, hûnere cînasê jî di tîpên ku pê hatiye nivîsîn bîrên nîşandan wê mijar çetir û hêsantir bê têgihiştin (Karak, 2020, r.121).

Hawara min bi te ya Reb nema min çareya **şebîrê**

Ez im bedhâl siyehkar im **perîqê** zînb û vê cewrê

Me rehber Şahê zanî çû li me şa bû kerê **qebîrê**

Bi vê beytê terennum kim heta bimirim biçim **qebîrê**

(Kazî, r.2/2)

3.5.Tenasub

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankariyê wisa jî bi nav bikin, "peyvên têkildar/peyvên pêwenddar". Ji bêjeyên ku ji hêla wateyê ve yan jî ji hêla têkilîyê ve nêzîkdar bin û gava ev bêje bi hev re bê bikaranîn hunera tenasubê derdixîne holê. Di vir de herî kêr du bêje, biwêj an têgehên ku ne bi qesda wateyê de û di nav rêzîkê an malîkê de bê bikaranîn hene. Peyvên ku li dora mijarekê digihêjin hev û bi hev re pêwendîya wan hebe li wir tenasub jî heye. Rojen Barnas ji vê hunerê re bêjeya "Lihevî" bi kar tîne (Karak, 2020, r.109).

Tenasûb ku tê wataya komkirina du peyvên ji aliyê telfûze ve ne pêwendîdar in lê ji aliyê watayê ve têkildar in. Wek mînak di sûre rehman de

{ الشَّمْسُ وَالْقَمَرُ بِحُسْبَانٍ (5) وَالنَّجْمُ وَالشَّجَرُ يَسْجُدَانِ (6) }

(Sûreyê Rehman,

Li gorî ayeta 5 ê ku tevgera roj û hey vê li gorî hesêb e, û ayeta 6 ku stêrk û dar jê re secde dibin.

Di helbesta klasîk de hunera nîsbetê xwedî girîngiyeke mezin e. Ev huner bi peyvên ku bi hev ve girêdayî ne, an jî ji hêla wateyê ve nêzîk in, pêk tê. Di helbesta kurdî de dibe ku peyvên bi hev ve girêdayî yan jî bi hev ve girêdayî wek beşek ji "hunera nîsbet"ê bîr bikaranîn. Lê eger peyv bi şert û mercên nakokî di navbera wan de bîr bikaranîn, ev yek hevsengiyek çêdike, û bi vî awayî lihevhatin bi ser nakeve.

Mînak:

Rûhîya! Bes bêje van Çi"rê Çewat ê pur-hezîn

Bo te digrîn dar û ber, deşt û çiya, ax û turab

(Aqtepî, 2019, r.47)

Ta`et dikî bê pa û dev

Çendî dikî çûna li hev

Dengê te tê bi **roj û şev**

Zikrê dikî bi `haletê

(Teyran, 2014, r.112)

"**Dengê te tê bi roj û şev**" nîşan dide ka telfûz bi hestên xwe ya rûhî têkildar e, ku her weha "şevan û rojan xew netê" diyar dike.

Dengê te tê bê Pê û hev

Ta`et dikî bê qelb û dev

Peyda dibi j`te Mewc û Kev

Şîn bûy ji rengê qudretê

(Teyran, 2014,

"Bê pê û dev" nîşan dide ka telfûz bi awayekî zindî çêker dibe. Ev diyar dike ku di cihê rûhî de telfûz çêker e.

Encam

Helbest cureyeke edebiyata Kurdî ya Klasîk e, ku di sedsalên navîn de pêşketiye û heya serdema nû jî berdewam dike, li ser bingeha kevneşopîya helbestvanên Kurd. Ev helbest beşeke girîng a mîrata edebiyata Kurdî tê dîtin û nîrxên çandî, olî û felsefî yê civaka Kurdî di hemû serdeman de nîşan dide. Helbesta Kurdî wek stûneke kevneşopîya ziman û edebiyata Kurdî a Klasîk e, di çarçoveya civaka Kurdî de bûye şahidê pêşketin û piştgiyê mezin. Helbesta Kurdî temayek dewlemend e ku nasnameya çandî, hestiyarî, dîrokî û hebûna Kurdan û jiyana wan a rojane dihevdî.

Ev vekolîna me ya bi navê Nirxandinek li ser Teknîka Helbesta Kurdî a Klasîk li ser lêkolînên kûr ên têtîliya zimanê Erebi û helbesta Kurdî ya klasîk e, bi balkişandina li ser wê yekê ku helbestvanên Kurd çawa peyvên Erebi bi şeweyên rewanbêjiyê di nav berhemên xwe yên helbestî de asîmîle kirine. Ev pêwendiya di navbera zimanê Erebi û Kurdî de ji sînorên metelokên zimanî yên sade derbas dibe da ku lihevhatineke kûr di pêkhatiya rewanbêji û hunerî ji aliye asîmîlasyon ji peyvên Erebi û rola dengdêrên kurt di asîmîlasyonê de û têtîliya zimanên Kurdî û Erebi ku teknîkên hûnerî yên wek aheng, îqtîbas, kînaye, teşbîh, tenasub nîşan dide, ku ev yek nîşana asteke bilind a şarezaiya zimanî di nav helbestvanên kurd ên klasîk de ye.

Em dikarin wekê Pêşniyar bi çend xalan armanc binirxînin ji bo lêkolînên pêşîn

1. Ji ber ku helbesta Kurdî beşeke bingehîn a edebiyata klasîk e, pêdivî ye ku lêkolînên din jî bi awayekî girîng di bin çarçoveya vê edebiyata kevneşop de bêtin zêdekirin.
2. Pêwendiya zimanê Erebi û helbesta Kurdî divê bi çavdêriya zanistî û hînbûnên ziman re were lêkolîn kirin.
3. Teknîk û rêbazên hunerî yên rewanbêjiyê, wek aheng, îqtîbas, teşbîh, tenasub û kînaye, ji pêkanên taybet a edebiyata klasîk hesab dikin. Ev amûrên watexwestinê û çêkirina estetîkê di helbestên Kurdî de nikaribûn tenê bi şeweya zêwî were bikar anîn, belkî bûn bingeha çêkirina şewazek taybet ya ramanî û hisî. Ji ber vê yekê, lêkolînên pêşîn pêdivî ye ku van rêbazên rewanbêjiyê bi balê zanistî, bi şiklê fermî û herî zêde ji aliye fonksiyona wan di xebata helbestî de bêtin şîrove kirin.
4. Gava ku li ser zimanê Erebi û tevsîrên wî tê lêkolîn kirin, pêdivî ye têtîliyên wisa bi zanistê zimanê ve were şîrove kirin
5. Di bin çarçoveya vê mijarê de, pêdivî ye arşîvên helbestên klasîk ya bi her du zimanê were berhev kirin.

Di encamê de, helbesta klasîk ya Kurdî wek şehîdê ziman, çand û nasnameya Kurdî tê dîtin. Di heman demê de, peywendiya wî bi zimanê Erebi gelek derfetên lêkolînê digihîne berdestê me. Ji ber vê yekê, pêdivî ye ku lêkolîneran paşî di vê mijarê bi dirêjahiya xwe tene berdestkirin da ku dikarin liser rola ziman, huner û asîmîlasyonên zimanî şîroveyekî rûhî û zanistî bidin.

Çavkanî

- Adak, A. (2015). Destpêka Edebiyata Kurdî, Weşanxaneya Nûbiharê, Stenbol.
- Adak, A. (2017). “Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizîrî De”, Mukaddime, 8 (Özel Sayı 1), ö41-ö76 doi: 10.19059/mukaddime, 364775).
- Adak, A. (2019). Teşeyên Nezmê, Weşanxaneya Nûbiharê, Stenbol.
- Aktan, M. F. (2020). Şaban Kâmî'nin Divanında Âyet İktibasları ve Telmih Örnekleri. *Eski Türk Edebiyatı Araştırmaları Dergisi*, 3(2), 517–538.
- Al-Şa'îdî, A. (2005). Bughiyat al-'İdâh li-Talkhîş al-Miftâh fi 'Ulûm al-Balâghah, Maktabat al-Adab-, capa 10, Qâhira.
- Atîq, A. (1982). İlm al-Bayân, Dâr al-Nahḍah al-'Arabîyah- Bayrût, Lubnân.

- Demaşqi, E. (1996). Balaxa Erebiye, Dar El-Qelam, Şam, Dar El-Şamiye, çapa 1'ê, Beyrût.
- Demir, Y. (2019). “Dîwana Namî (Fehmî Begê Pêçarî): “Meğmuru”Ddewawîn”, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî.
- Deniz, M. (2017). Jiyana Seyid ‘eliyê Findikî û Dîwana wî, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Muş Alparslan Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- İnci, V. (2020). Îqtîbas Di Edebîyata Kurdî Ya Klasîk Da (Helbestên Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û Melayê Bateyî), Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanê Zindî Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî.
- Karak, M. (2020). Dîwançeya Şêx İsmetullahê Karazî”, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Keleş, R. (2016). Divan Şiirinde Âyet ve Hadis İktibasları. İstanbul: Kitabevi.
- Melayê Cizîrî. (2012) .Dîwan. Tehsîn İbrahim Doskî (Amd.). Stenbol: Nûbihar.
- Melayê Cizîrî. (2018). Dîwana, Mela Ebdusselamê Cizîrî, Şerha, Dara Yayınları.
- Misirî, M. (2004). El-'Amîd fî 'İlm el-Tajwîd, Dar el-'Aqîde, İskenderiye.
- Sadinî, X. (2014). Jiyan Berhem û Helbestên Feqîyê Teyran, weşanên Nûbiharê.
- El -Cezerî, Ebdusselam, (2004) El-Iqdu'l-Cewherî fi Şerhî Dîwani'ş-Şeyxî'l Cezerî, (Amd.: Tehsîn İbrahim Doskî), weşanxaneya Spîrêz, Duhok.
- Septioğlu, A. (2005). Melayê Cizîrî Divanı'nın Şerhi, weşanên Nûbiharê.
- Şêx 'Ebdurrehman, A. (2019). Dîwan, Hêvîdar, Mehmed Emîn, weş. Dara, Stenbul.
- Teftazani, S. (2018). Muxtesaru'l-Me'ânî, Weşanxaneya. Salah Bilici Kitap, İstanbul.
- Yılmaz, M. (2023). Mela Ebdulmecîdê Gulordî'nin Şiirleri”, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Muş Alparslan Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Yıldız, Z. (2020). Lêkolînek Li Ser Dîwana Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî (Rûhî), Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Bingöl.